# GOLIK

Golikê ber dilan natirse ji gayê malan!
Kovara Qerfî Ya Bi Kurdî

Tebax
îlon
2015
Hejmar 13



www.arsivakurdi.org

Golik XANE













## MÊRDÎN NEWS

Belê xwendevanên hêja. Yên dizanin ji xwe dizanin, yên nizanin bila ji xwe re vê quncikê bixwînin.

Berê vêya demek kin, wek tê zanîn lîstikvana Hollywoodê a xweşik û delal Angelîna Jolie ji bo serdana koçberên Sûrîyê hatibû Mêrdînê. Piştî serdana xwe ya xêrê, xwest Şaredariya Bajarê Mêrdînê jî ziyaret bike.

Ser vê esasê, Şaredarê Bajarê Mêrdînê Xalê Ehmed dest bi amadehiya pêşwazîkirinê kir. Koma folklorê a Şaredariyê derxist ber derî û kasetekî Emînê Erbanî danî ser teybê. Angelina çawa xuya bû folklorvanan xwe hilavêtin, kurmê xwe li ber lingê Angelina rijandin. Û me carek mêze kir em çi bibînin! Angelîna me jî ketiye nav govendê û xwe hildavêje. Şahidên vê bûyerê sond dixwarin digotin: Me Angelina nasnekiriba me yê bigota qey yeka Mêrdinî ye. Wilo xweş dileyist"

Erê xwendevanên hêja tiştê me jî dît Angelîna xwe hildavêt û qîreqîra wê bû: "wow! yeah! oh yeah! Û gazî Xalê Ehmed dikir digot: "come on! uncle Ehmed come on! Xalê Ehmed jî weke her tim bi rûyekî ken digot: "no thank you. I have battery in my heart. I can't jump.

Piştî merasîmê Angelina di nav xûdanekê de mabû. Xûya bû ku zaf kêfxweş bûye. Ji kêfxweşiyê xwe winda kiribû Digo "oh my god, ez li kuderê me. Min di jiyana xwe da tiştek wisa crazy, dînokî nedît. Kêfa min zehf ji Mêrdiniyan re hat. Bi taybet ji zilamên Mêrdinî re... Hemû "handsome" in yani bedew û çeleng in. Bila Brad min biborîne lê ev rastiyeke" got û bû hîqa hîqa wê.


Berdewamiya axaftina xwe de agahiyek din da got: "Ez ê car din werim Mêrdînê. Lê eger wê demê navbera min û Brad xirabûyî be wê çaxe dikarim zewaca bi yekî Mêrdînî bifikirim û dîsa bû hîqe-hîqa wê.


Piştî serdana xwe ya Şaredariyê çû nava bajêr. Di kanan geriya, bazara tiştan kir. Di dîkana kasetfiroşekî de hemû kasetên Emînê Erbanî kirî û got: "zehf kêfa min ji mûzika wî hat, ez ê li malê pê yogayê bikim

Erê xwendevanên hêja tiştê herî balkêş; gava lîstikvana xweşik li balafira xwe siwar bû û ber bi welatê xwe firî û hêj lingê wê li erdê neketî bû, daxuyaniyek ji Sultanê Mêrdîne hat. Sultanê direj-ewê bi qam û bilindiya xwe ketibû rekora Güinesê,- namzediya xwe ya ji bo zavatiyê eşkera kir.

Niha de em ji civan û xortên Mêrdiniyan re serkeftinê dixwazin.

A. Bozkaya


DIBÊJIN PISIKÊN WANÊ PISIKÊN ESÎL IN VIRE, DEREWEKE MEZIN KIRINE BIJÎ PISIKÊN AMEDÊ! BIJÎ EZ! BIJÎ SOROK PÎSO!
Goşîst Pîşo
O. Raman
HER PISÎKEKÊ AMEDÊ BERDÊLA DINYAYÊ YE! BIJÎ PISIKISTAN!
AAX! XALÊ MIN Î QAL MÎRO. TIR LI VÊ SÎSTEMÊ QETIYA YE. XEYALETEK LI SER SERÊ AMEDÊ DIGERE!
SÎSTEMA WELÊT XERA BÛYE. DE JI XWE RE LI VANA BINÊR IN. MA BERÊ WERÊ BÛ? PIŞIK Û KUÇIK LI SER SERGOKÊ. TEW MALA MINÊ!
DINYA FISE ULAN!
BIJÎ ANARŞISM!
DIVÊ EV SÎSTEM BIGUHERE. EV TIŞT MILLETÊ ME DEJENERE DIKE. DIVÊ PISIK LI CEM PISIKAN, KUÇIK LI CEM KUÇIKAN, KER, LI BA KERAN BE HEYRAN. LÊ DIVÊ BERÎ VÊ EM BI HEV RE TEVBIGERIN HETA ROJA...
Jin Jiyane
BIJÎ GOŞÎST PÎŞO
HEMÛ PISIK, KUÇIK Û KERÊN AMEDÊ! BIBIN YEK Û AZADIYA XWE BI DEST BIXIN OXLIM! EV ÇI YE EM JI BELEDIYA AMEDÊ DIKŞÎNIN! HEMÛ ZIKAK, KUÇE, KOLAN YÊN ME NE!
Çop atma oxlim!
SAREDARIYA AMEDÊ ÇUP
EYSANÊ LÊ EYS TIRIK BERDA NIŞANÊ
BELEDIYA AMEDÊ ÇOP
EM JI BELEDIYA XWE RAZÎ NE KEKO. WELLEHÎ HER BIJÎ JI SEROK BAŞQANÊN ME RE! EV ZIKAK Û KOLANÊN AMEDÊ KIRINE WEKÎ EYNIKÊ HA.


Bêriyên ji Zindanê
Zîlan Bawer
TIMARHANE
HAPÎSHANE
Jînxalê ka hele ji bona zarokên min sonda xwe bi careke xera bike. Ka qismetê herdu keçên min çawan in?
Bi rastî min sondek mezin xwaribû. Lê dîsa jî dilê te nehêlim! Ya mezin cihekî pir fireh de ye. Hewşa mala wê pir mezin e. Bexçê wî şînahî ye. Ew jî hema tê de digere û rûdine! Ya biçûk: cihê wê pir mezin nîn e lê xaniyê wê jî du qat e. Xizmetkarê wê hene.
maşala maşala te çi qas xweş go! Dilê te sax be.
Zilan-Hemed
Zanyar dibêjin di demên ayende (paşeroj) de şiklê mirovan dê wiha be:
Ji ber ku pir compiturê temaşe dike çavên wî dê mezin bibe. Mêjiyê wî dê biçûk be, lê destên wî dê dirêj be. Ji ber ku naxwaze di cihê xwe de bilive û dixwaze her tişt di bin destên wî/wê de be. Pêdiviyên xwe di cihê xwe de runiştiyayî pêk tîne.
Amûrên ku derûniya mirov xera dikin, ango teşeya mirov de mutasyonê çêdike; yek teknolojî ye, ya din sîstema desthilatdariyê ye.
Di zindanan de em demdirêj hemberî vê amûra duyemin rûbirû ne. Faşizma Te C'êl cih li me teng kiriye. Em xistine quncaleke biçûk, Ne cihê gerê heye ne cihê werzişê (spor).
Hemû pêdiviyên xwe li ser ranzayê rûniştî pêk tînin.
Jiber ku em nikarin durahiyê temaşe bikin sipîçolka dîwarên hepsê çavê me xera kiriye.
Her tim dixwînin, dinivîsin dihizirin, mêjî mezin dibe beden di hundir de dirize.
TÊBINÎ: Bi tevlîbûna we em kêfxweş bûn hevala Zîlan Bawer. Cara ewil me piçekî xêzên we sererast kirin. Êdî zend û bendên xwe badin serkeftin ji we re...
Zilan-Hemed

GOLIK

Burhaniye T Tipi Cezaevi Balıkesir



# PONIJÎN

Hemed GERGERÎ
























**NOTİCE: More than thousand war - prisoners are in jail in Turkey's prisons for twenty years.**

# PERVASIZ SEÇKİN



seckin.golik@gmail.com


























Ben aşk çocuğuyum*
* Prezervatif delik çıkmış!
Negotin
Burnun ne güzel, ufacık tefecik*
* Bunun kesin şeyi de ufacık tefecik!..
Aramızdaki yaş farkı sonra proplem olmasın!..*
* Şahane boynuz modellerim var.
Bu ülkenin kaosunu seviyorum be ya!..*
* Tecavüz kaçınılmazsa zevk almaya bak!..
Hemed
Beri hevşabûnê çend gotinên eyb bavêje ber guhê min!
oxxx!...berdewam bike
Erêê (!)
Tirkiye welatekî dadwer e.
Li Tirkiyeyê belasebep kesî navêjin zindanê.
Pîrê tu bi ku de diçî?
Rovîyo muyê qûna te spî bûne tu hîna li pey fen û fûtan e.







# QÎRÎNA QIRIK

Dibêjin dengê qirikan (karga) nexweş e. Bila dilê wan camêrên dengnexweş nemine lê kesên dengê wan ne xweş be em jî ji mecbûrî radibin dibêjin dengê wî/wê mîna dengê qirikan e. Heger ew mirov teqlîda dengên hozanên dengxweş nekin û bi zorê neşibihînin wan, belkî dengê wan ê xwezayî xweş be.

Ma qey belesebep gotine her tişt li gorî xweza û eslê xwe xweş û tehmdar e. Gava mirov mîna xwe tevbigere qet nebe dê temsîliyeta kesayetiya xwe bike. Lê gava mîna xwe tevnegere nikare temsîliyeta tu tiştî bike.

De em dîsa werin ser mijara qirikan. Em binêrin bê çima dengê wan ketiye vî halî.

Rojekê qirikekî biçûk, reşik û xweşik di ber mala bilbil re derbas dibe û diçe mala xwe wê hingê qey kela dilê bilbil rabûye ji xwe re dixwîne û dixwîne. Dengê bilbilê xweşawaz diçe guhê qirikê biçûk. Qirik disekine û guhdar dike. A rast, dibêjin wê çaxê dengê qirikan ji pir xweş bûye, lê dema dengê bilbil dibihîse xwe qanih dike ku dengê wî li ber dengê bilbil ne tu deng e. Diçe mala bilbil û jê re dibêje:

— Kekê bilbil dengê te pir xweş e. Ka min jî hîn bike da ku ez jî wekî te xweş awazan bixwînim.

— Bilbil dibêje:

Heyran dengê qirikan jî ne xerab e. A din jî ez bilbilim tu qirik î. Helbet dibe ku dengê me hinekî ji hev cuda be, tu ne mecbûrî mîna min bixwînî.

Bilbil dike nake qirik bela xwe jê venake, dibêje heye tuneye min jî hîn bikî ku ez wekî te xweşawaz bibim. Bilbil xelasiya xwe jê nake û dibêje:

— Temam, tu here li ser çiqilê wê darê vene ez têm.

Kêf kêfa qirikê ye. Bi coş û peroş diçe li ser çiqilê darê vedine û li hêviya bilbil disekine. Keliyekê şûn de bilbil tê û dibêje:

Ez ê niha bixwînim, lê belê tu baş li min guhdar bike. Piştî te baş guhdar kir tu yê dûre li min vegerînî.

Qirik dibêje:

— De bila be, ez ê li te guhdar bim kekê bilbil. Bilbil bi wî dengê xwe yî xweş û zelal dest pê dike û dixwîne. Dengê awaza wî hawirdorê şa dike. Qirik bi dengê mest dibe û di xew de diçe. Bilbil dixwîne û dixwîne. Careke dinêre qirik raketiye. Di dilê xwe de dibêje de tişt nabe, ez fêrî dengê wî bûm êdî pêdiviya min bi wî nîn e.

Di wê navberê de hewil dide ku wekî bilbil bixwîne lê dengê wî dernayê. Tenê qirr. qirrr... qirrr... dike.


Îcar dixwaze wekî dengê xwe yê berê bixwîne. Lê dengê wî jî çû ye. Ji bilî qirrr qirrr tişt nîn e. Ji sedema qirre qirra wî ji wê rojê û vir ve navê wî bûye qirik. Hem fêrî dengê bilbil nabe, hem jî dengê xwe jî bîr dike.

Divê mirov hewil nede xwe bişibihîne hinên din. Nexwe mirov cewherê xwe jî winda dike. Kes û civak jî, siyaset jî huner û wêje jî gava ku li ser bingehê xwe be xweşik e. Gava xwe bişibihîne hinên din dê çarenûsa qirikê biji.

Nebêjin ev Bozo dîdaktîk û şiretvan e. Na welê, tew nizanim dîdaktîk mîdaktîk çi ye Bi hêviya ku her kes mîna xwe be û jiyan xweş be.

Dirûşma dawîn: Bila mirov wekî xwe be, da ku bi têra xwe hebe.

BOZO.



# Kevkanî

Burhaniye T Tipi Hapishanesi


**Ûsıv Amed**



























www.arsivakurdi.org

# Kimtêl

**Ahmet Bilge**

*Elbistan E Tipi Hapishanesi*
*K.MARAŞ*


























arsivakurdi.org


# BARIŞ İNAN






























www.arsivakurdi.org


Vê hefteyê min performansa we neeciband.
TOP MODEL
Remziye
Hamdiye
Raziye


Ji pey dûva min neqete temam e
Reco kûçikê te bim min jî li ber qesra xwe girêde


Xwedê kesî birçî nehêle înşella. Te nimêja xwe kir heciyo??
Erê erê min kir. Min Qurana pîroz jî xwend.




DİREN CUDİ
DİREN CUDİ
HER YER DİRENİŞ HER YER CUDİ


Kampus cafe


BIJÎ BERXWEDANA ÇÊLEKAN


Dayêêêê..!!!

# REMILDANG

Payîz BAŞET



**BERAN**
21 Adar- 20 Nîsan

Tu disa li pey dek û dolaban î. Xwedé bizanibe ka té mala kija belengazî véran bikî...Ahûra Mazda wî ewdalî bide xatiré ezîz û ezîzeyan. GA:Enerjiyek pozitif li dora te bûye xelek; daxwaz û mirazén te hasıl dibe, çavén te roni be! Kéf kéfa te yé!



**ŞÊR**
23 Tîrmeh— 22 Tebax

De tu jî pir famkor û serhişk î lo! Li keré şeytîn sivar búyi û ya xwe nayé xwaré...ka demokrasi û ka xweşbini bavé min, ma hema té tené muxalefet bikî,té cané me zer kır weleh!




**GA**
21 Nîsan—. 21 Gulan

Hîv di bin bandora jupiteré de ye û ew yek bi xwe re enerjiyek pozîtîf arasteyî te dike.Mala Xwedé ava, ma tu édî çi dixwazî mala min?!



**SIMBIL**
23 Tebax 23 Îlon

Hewar ji derdé te! Ew mirata tiliya te di nav her tişti de ye, ma tu bûyî mixtaré gund roniya çavén min?! De hema careki pé li fréna trénbéla xwe bike gidî!



**CÊWÎ**
22 Gulan— 21 Hezîran

Nietzscheyé camér dibéje"tol-hildan carna baş e"; ji loma jî xwe zéde neqehirîne û neavéje hundiré xwe. Xencera xwe túj bike û dakeve qadan .



**MÊZÎN (TERAZÎ)**
24 Îlon – 23 Cotmeh

Ranezé li ciyén kaş, da nebînî xevnén şaş! Tu hım dikî hım jî dixeyidi. Carna ji kémasiyén xwe tecrubeyan hilîne heyran û hebekî xwe"geliştîrmiş"bike.



**KEVJAL**
22 Heziran 22 Tîrmeh

Éé wisan e heyran! Meriv here masiyan dé şil bibe; karé entel û dantélan seréşî ye, loma zéde gazincan neke û ji xwe re " yoğunlaşmış"bibe.




**DÛPIŞK**
24 Cotmeh– 22 Sermawez

Bizin bizin e le disa jî ciyé xwe dikole û paşé mexel te. Din-iman te ji Oblomov jî borand û ber bi Teralé Bexdayé ve dimeşî. Ew çi hal e gidî!



**KEVAN**
23 Sermawez- 21 Kanun

Tu dipîvî û dibirî li hev nayé. Dibe ku romantîzma payîzé li te aliya be! Here cem Feqiyé Teyran da ku psikanalîza te bike û hişé te komî seré te bike. Derbasi be!



**DEWLIK**
21 Çile– 19 Sıbat

Xeman neke! Tu nebî parlementer jî guh nedé, emé ji te re qoltoxekî rihet peyda bikin, da ku tu jî stuxwar nemînî.



**KARIK**
22 Kanun– 20 Çile

KARIK:Ew demek e tu li benda xeberek xweş î. Xeman neke! Waye ew roj hat! Dé ji te re mizginek xweş bé û keyfa te xweş be!SEQA:Gava ez te dimînim, belengaziya lehengén romanén Dostoyewski tén bira min. Xwedé alikaré te be!



**MASÎ**
20 Sibat- 20 Adar

MASÎ:Ji ber ku heyv çardhşevî ye û geş bûye, dé wan rojan ji te re e-mailek baş were û dé jiyana ji binî ve biguhere. Lé ew mesahek cava ye em nizanin...

























# Berxên Kozikan















GARAN
SENAR DOLAZ


Rehmetî Gayek baş bû...
Yaw ez dı cıwantiya xwede çı mêrek bûm !
Berdeee ehmêêê !
Oxxx ! bıxwe,vexwe û rakeve... Mala xwedê ava
Xwedêyo! tu hema bı ser mın de hestiyan bıbarine
Gevramınê mın got ez nexweş ım...
Dîn-îman serê mın mîna siyaseta tırkiyê bûye keledoş...